

Dumahîk : Parastina...

bizinê kar e". Dibêjin, bi meşkan dew dikên, û şap-şapa meşkan dibe melodî û awaz ji bo gundiyan. Teyr û tûr jî di qul û şikeftan de derdikevin, ew jî li hewa difirin, bi buharê şadibin, ji xwe re hêlînên nû çêdikin, têda hêkan dikin, kurk dibin çêlikan tînin der, û ew jî wek me mirovan û hemû jîndaran bi çêlikên xwe şa dibin. Gelo rewşa îro li Kurdistana bakûr wek van gotinên min e?. Ez bawer nakim. Gotinê min ên li jor, ji bo şêst sal berê ne xwendevanên hêja. Sî (30) sal e, ku di wî welatî me de şerekî bi xwîn heye, sed hezar (100.000) kesên me hatine kuştin, çar hezar gund hatine hilweşandin û şewitandin, bi milyonan Kurd koçber bûne, ketine nêzî metropolên dijmin; tazî û birçî, bê kar, bê war û bê mal mane. Di pagê malê gundiyanê Kurd de, kund dixwînin, mişk û maran hêlîn çêkirine, beraz tijî bûne. Gundên ku mane jî, niha di wan gundan de, ne meşk mane û ne sêpê, ne ga û gam, ne bêder, ne nîr, ne jî hevcar û gîsin. Di dewsa van de patoz û traktor hene. Meşk, lolewî, kêrî, sêpê, nîr, hevcar, tapan û gîsin bûne hacetên kevin, ango kilasîk, antîka. Êêêêêê cîhan e, ken û kêf û dîlan e/ Derd, kul, keser, êş û jan e/ Mirov jî pitik e, xort e, ciwan e/ Roj tê kal û pîr e, bê teqat û mecal e. Ne wisa?. Belê, di zaroktiya min de, rewş wek gotinê min ên jor bû, lê bîst û yekê Adarê wekî cejn nedihat pîrozkirin. Erê, navê gelek keçên me Newroz bû, lê cejn û dîlanî tunebû li herêma me, balam li hin ciyên din rewş çito bû, ez wê nizanîm. Ji ber ku li piştî 14-4-1951'ê de ez ji welêt derketim, bûm terkî-welat, li piştî sala 1979, cara yekem di vê kişwera kevin de - Awistûralya- ez bûm nasê cejna xwe ya Newroz û dîlaniya vê roja pîroz.

Heman wisa xwendevanên delal, ez serê we nêşînim, vêca jî werim ser êş û jana meha Adarê. Çira min got "Bi êş û jan e?. Bi rastî,

piştî tevgera hesinker, mêrxwas û lehengê Kurd Kawa yê gorbihîşt, di tevahiya dîroka gelê Kurd de, mehên Adarê çito û çawa derbas bûne, ez wê rind nizanîm; lê, li destpêka sedsala bîstan heya roja îro, ez pir, hindik dizanîm di meha Adarê de li welatê min çi bûye, çi bûyer qewimîne. Bê derew di sedsala bîstan de, meha Adarê ji me Kurdan re bûye meha reşgirêdanê. Tevkujiya Dêrsim di bihara sala 1937'an, meha Adarê dest pê bûye û dijminê zalim li ser wî erdê evrar û pîroz, heftê hezarî zêtir (70.000) gelê me bi barbarî kuştiye, û ev meha ji me re kiriye meha reşgirêdanê. Li pey wê sal û rojan, dîsa gelek bûyer di vê mehê de cî girtine, gelek Kurdperwerên Kurdistanê hatine kuştin.

Dîsa di diwanzdehê (12) Adara 1971'ê de bîrname ya faşîzmê û kuştina gelek kesan û dardakirina sê xwendevanên ciwan, ku ez bawer im ji wan dudu Kurd bûn, Huseyîn Înan û Denîz Gezmîş.

Li pey wê barbarîya Roma Reş, vêca jî di şanzdehê (16) Adara sala 1988'an li başûrê Kurdistan, Sadamê zorba, zalim û faşîst, li ser Kurdên bajarê Helebce bombeyên kîmyewî bi karanî û barand. Di wê barbarîya ne mirovî de, pênc hezar (5000) zar- zêç, kal, pîr, jin, bûk, keç û xortên me cangorî bûn, deh hezar (10.000) kes jî birîndar, seqet û kor bûn. Ji ber vê yekê ye, ku ez dibêjim "Adar e, bi êş û jan e/ Him cejn e, him dîlan e. Çira dîlan e, min li jor got. Niha jî bi destûra we ez li jêr ji we re helbesta xwe ya ku min ji bo tevkujiya Helebce di wê salê de nivîsîbû, binivîsînim. Berê ku ez destpêka nivîsîna helbestê bikim, ez wek Kurdekî Kurdevîn, li pêş giyana hemû cangorîyanê Kurdistan, bi rêz serê xwe xar dikim, ditewînim, ku heye "Ciyê wan bihuşt be, di nav şewqê de razin" dibêjim, wan bi dil û can jî bîrtînim.